



Umîd Demîrhan

Hînkerê

Zîmanê

Kurdî **[2]**

Perwerdehiya Destpêkî

Çapa jimarîn a bêpere



1 Rojbaş!

Navê te çi ye?
Ev çi ye?
Jimare 1-10

Tu çawa yî?
Ev ... e/ye.
Pirjimarî

DESTPÊK

1. Were, em hev nas bikin.

- A** Rojbaş!
B Rojbaş!
A Navê min Azad e, lê navê te çi ye?
B Navê min jî Bedirxan e.
A Bibexşîne, ew çi ye tu dixwî?
B Kakilê gûzan e.
A Darên we yên gûzan hene an na?
B Belê hene.
A Çend darên we yên gûzan hene?
B Bi rastî min nejimartiye.



- A** Tu dizanî ev çi ye û bi kêrî çi tê?
B Erê ew singek e û bi kêrî lêxistinê tê.
A Ji bilî lêxistinê bi kêrî çi tê gelo?
B Nizanim, nehat bîra min.
A Bi kêrî guherandina pergala zilmê jî tê.
B Pergal çi ye hevalo?

2. Were, em rewşa hev bipirsin.

- Rojda** Merheba Nalînê, tu çawa yî?
Nalîn Baş im, sipas Rojdayê; lê tu çawa yî?
Rojda Ez jî baş im, sipas. Ev çend roj in ku te xuya nedikir, meraqê ez kuştim keçê!
Nalîn Rast e, ev hefteyek e ez nexweş im; hîn jî pak nebûme.
Rojda Şifaya xêrê be! Ez lêborîna xwe dixwazim, bawer bike haya min pê tunebû.
Nalîn Gelek sax bî, sipasî ji bo naziktiyê.



HÎNKARÎ

1. Çiroka jêrîn bixwîne û bersivê bide pirsan.



legana tehevêlkî



nikilê leglegê

MÊVANÎ Û MAZÛVANÎ

Hebûye û tunebûye. Rojek ji rojan roviyekî kone diçe ber hêlîna leglegê û silavê didê. Legleg silava roviyê kone werdigire û sedema vê serdanê dipirse. Rovî dibêje:

"-Xwîşka legleg, ez dizanim ku te hêlîna xwe li ber perê esmanan çêkiriye û tu tenezilî me nakî; lê dilê min heye ku te vexwînim şîvekê."

Legleg dibêje:

"-Birayê rovî! Ev ne eyd e ne jî erefat e. Te xêr e, çi qewimiye ku tu mêvanan xwedî dikî?" Rovî bi konetî dibêje:

"-Dawiya qezenca dinyayê mirin e. Min di emrê xwe de pakiyek nekiriye. Çavê min lê ye ku beriya mirina xwe qenciyekek bikim û wisa derkevim hafa Xwedê." Legleg pêşniyara roviyê kone dipejirîne û dibe mêvanê wî; lê rovî dest ji rovîtiya xwe bernade. Rovî radibe, şorbeyekê çêdike, valayî leganên tehevêlkî dike û dide ber mêvana xwe. Legleg çend nikilan lê bixe jî tiştêk bi ser nikilê wê ve nayê. Rovî dike şelpeşelp, legana li ber xwe dadilêse û diqedîne. Legleg jî emadê xwe xera nake, roviyê kone vedixwîne şîvekê, xatirê xwe jê dixwaze û diçe ser hêlîna xwe.

Dîtira rojê legleg jî şorbeyekê çêdike, valayî şûşeyên devteng dike û dide ber mêvanê xwe. Rovî carekê diduyan zimanê xwe li devê şûşeyê dixê; lê tiştê bi sere zimanê wî ve nayê. Legleg jî bi noşîcan şorbeya xwe fir dike û vedixwe. Rovî lê dinêre ku leglegê ji ber hîlebaziya wî ceza dayê, lewre şorbe di vê şûşeya devteng de daye ber wî. Ji ber vê yekê jî pir diqehire, xatirê xwe ji leglegê dixwaze û diçe.



1. Rovî çima diçe serdana leglegê?
2. Mazûvaniya roviyê kone çawa ye? Gelo legleg bi mazûvaniya wî kêfxweş dibe an na?
3. Mazûvaniya leglegê çawa ye? Gelo rovî bi mazûvaniya wê kêfxweş dibe an na?
4. Derheqa rêbazên mêvandarî û mazûvaniyê de ramanên xwe vebêjin.

2. Dîdariya jêrîn temam bike.

A Hevalo merheba, ji kerema _____ re cixareyekê nadî _____ ?

B Heyfa canê _____ ye. Qe vê zîqûmê _____ ! Wexta ku pereyên _____ tunebin jî qet nekêşe!

A Ka _____ jî heqê livek cixareya te bidim. Ji bo cixareyekê ewqas axaftin hewce nake.

B Malavayo mijar ne mijara heqê cixareyekê ye. Mijar _____ e ku mirov ji bo cixareyekê devê _____ li kesekî nenas venake.

A Kambaxa kurmê cixareyê mirovan muhtacî nemerdan jî dike.

B Madem te _____ kirim nemerda _____ binika cixareyê jî nadim te.




FERHENGOK

Ev bi kurdî çi ye?

1. Navên tiştan li ber wêneyên wan binivîse.

gerdenî	wêneguhêz
pênûs	pêlîstok
teyst	komers
paste	jêbir
nexşe	pirtûk
wêne	



1 | pênûs



2 |



6 |



3 |



4 |



5 |



7 |



8 |



9 |



10 |



11 |

2. Navên tiştan bipirse.

Ev bi kurdî çi ye?

Ew bi kurdî jêbir e.

3. Tu qe pêkenoqan dizanî an na? Ha ji te re pêkenoqek!

HÊRS DIBE

Azad hêj nû dest bi dibistanê kiribû. Mamosteyê wan ê ku hatibû fêrgehê, navê wan û yê bavê wan yeko yeko ji wan dipirsî. Dema dor hate Azad mamosteyî jê pirsî:

-Navê te çi ye?

-Navê min Azad e.

-Navê bavê te çi ye?

-Bavo ye.

-Ma navê bavê te tune ye?

-Sê birayê min hene. Êm hemû jî jê re dibêjin bavo. Lê mirovên din dibêjin Ehmed.

-Çima tu nabêji navê wî Ehmed e?

-Dema ez dibêjim Ehmed, bi min hêrs dibe.








KURDIYA ROJANE

Jimare 1-10

1 Jimareyan bi dengê bilind bixwîne.

1 yek 2 didu 3 sisê 4 çar 5 pênc 6 şeş 7 heft 8 heşt 9 neh 10 deh

2 Jimarnavan li ber wêneyan binvîse.



PIRJIMARÎ

deh pasteyên xweşik
du pirtûkên nû
şeş çenteyên reş
pênc kombersên kevn
çar malên yekqatî
heşt wêneguhêzên jimarîn
sê siwareyên spî

Pasteyan bixwe.
Pirtûkan dayne wir.
Azad çenteyan vedike.
Komersan bifroşe.
Li malan binêre.
Çima wêneguhêzan dişkênin?
Hay ji siwareyan hebe.



2 Welatê Te

Bajarên Kurdistanê
Tu ji ku yî?
Çinavkên Yekjimar

Ez Kurd im
Ez ji Kurdistanê me
Jimare 11-30

DESTPÊK

1. Di nexşeya jêrîn de bajarê xwe bibîne.




2. Navên bajarên Kurdistanê li gorî tîpên alfabeyê rêz bike û ji her bajarî re plaqeyekê çêke.

Erdehan Agirî Qers Sêwas Dêrsîm Erzîngan Mûş Çewlîk
Bazîd Mako Wan Bilîs Sêrt Êlih Amed Xarpêt Semsûr
Mêrdîn Gurgum Şîno Dîlok Peyas Cizîr Şîrnax Çolêmerg

Urmiye	Qamişlok	Zaxo	Amêdî	Akrê	Duhok	Mûsil
Rewandiz	Hewlêr	Dukan	Kerkûk	Mehabad	Bokan	Seqiz
Silêmanî	Helebçe	Kifrî	Bêjar	Merîwan	Sine	Qurwe
Xaneqîn	Mandelî	Bedre	Mêhran	Îlam	Gulan	Kudeşt
Kirmaşan	Birocerd	Nihawend	Malayer	Ekbatan	Pawe	Îdir
Erzerom	Kamyaran	Tewrêz	Qesra Şirîn	Zengilan	Kalbajar	
Laçîn	Meletî					

3. Kî ji kîjan bajarê Kurdistanê ye?



Navê wî Mahsûn Korkmaz
e. Ew ji Farqînê ye. Ew
farqînî ye.



Navê wî Evdirehman Qasimlo
ye. Ew ji Urmiyeyê ye. Ew
_____ ye.



Navê wê Ceylan Onkol
e. Ew ji Amedê ye. Ew
_____ ye.



Navê wî Cigerxwîn e. Ew ji
_____ ye. Ew êlihî ye.



Navê wî Ihsan Nûrî ye. Ew ji
_____ ye. Ew bilîsî ye.



Navê wê Leyla Qasim
e. Ew ji _____ ye.
Ew kerkûkî ye.

HÎNKARÎ


Bajar û navçeyên Kurdistanê

1. Ev bajarên Kurdistanê li ku ne?

Kirmanşan Poyas Urmiye Kalbajar Colemêrg Dêrsim Çolîk Mako Efrîn Mêrdîn

Li bakurê Kurdistanê ye.

Colemêrg li ku ye?



2. Pirs û bersivên jêrîn berawirdî hev bike.

Ew ji Farqînê ye û nasnavê wî Egîd e; lê navê wî çi ye?
Îhsan Nûrî Paşê ji ku ye?
Zaroka ku bi sarokeke leşkerî hatiye kuştin kî ye?
Helbestvanê gewre Cigerxwîn ji ku ye?
Tu çawa yî?
Mehabad li kê tûsê dikeve?

Ez baş im, sipas.
Navê wî Mahsûn Korkmaz e.
Li rojhilatê Kurdistanê ye.
Navê wê Ceylan Onkol e.
Ew ji Êlihê ye.
Ew ji Bilisê ye.

3. Valahiyan dagire.



A Merheba, _____ min Azad e. Navê _____ çi ye?

B Merheba, navê min _____ Koma ye.

A Ev çito nav e? Ma tu ne kurd î?

B Nexêr, _____ ne kurd im; _____ efrîqayî me.

A _____ çawa kurdî hîn bûyî?

B _____ di Bazîdsporê de hola pê dilîzim û ji werzîşkarên bazîdî hîn bûm.

A Hevalên te jî hînî zimanê te bûn an na?

B Nexêr, ma wextê wan heye ku hîn bibin? Ji serê sibehan hetanî êvaran li kolanan qareqara wan e. Di hemû guhên ker de diqîrin û dibêjin: "Ez kurd im!"

JIMARE 11-30



1. Van jimarnavan dubare bikin.

11 yazde	12 duwazde
13 sêzde	14 çarde
15 pazde	16 şazde
17 hevde	18 hejde
19 nozde	20 bîst

2. Nav û jimarêyan berawirdî hev bike.



21	bîst û pênc	
22	bîst û heft	27
23	bîst û yek	28
24	bîst û heşt	29
25	bîst û du	30
26	bîst û çar	
		bîst û sê
		sih
		bîst û şeş
		bîst û neh

KURDIYA ROJANE

Amed Çeko Jiyan û Nivîsbariya Azad Ubuntu


Amed Çeko Jiyan di 26ê reşemiya 1980î de li Sêrtê hatiye dinyayê. Dibistana seretayî û dibistana amadehiyê li wir kuta kiriye. Li Amed û Xarpêtê zanîngeh xwendiyê.

Demekê di kovara Tigrîsê de xebitiye û kovara Çirûskê weşandiye. Tevî hevalên xwe Koma PCKurd ava kiriye û Firefox wergerandiye kurdî. Ji rojnameya Azadiya Welat re malpersazî kiriye. Gelek xebat û nivîsarên wî yên li ser nivîsbariya azad Ubuntuyê hene. Her wiha romaneke wî ya bi navê “Varjabed” hatiye weşandin.

Ji Bo Kurdan Girîngiya Ubuntuyê

Ji bo kurdan heta niha ji sedî sed pergaleke xebatê ya bi kurdî nîn e. Cara yekem Ubuntu 6.06ê zimanê kurdî xiste nav lîsteya xwe. Tê zanîn ku piraniya kurdan Windowsê bi kar tînin; lêbelê taybetiyên baş ên Windowsê li ser Ubuntuyê jî hene. Ev taybetî ji bo kurdan gelekî girîng e.

Saziyên kurdan ên ku kar û barê weşana kurdî dikin bi Ubuntuyê karê xwe bi hêsanî pêş de dixin. Bernameyên nivîsê, yên hesaban, yên xêzkirinê û gelekên din li ser Ubuntuyê hem bi kurdî ne hem jî kontrola rastnivîsa kurdî dikin.





3 Agehiyên Kesane

Kar û Pîşeyên Mirovan
Navnîşan
Jimareyên Telefonan

Neyînî û pîrsiyarî
Pênaseya Kesane
Jimare 31-100

DESTPÊK

1. Li ber her wêneyî pîşeyekî guncan binvîse.


hemşîre ajokar mamoste bijîjk pîlik xwendekar karsaz çerçî



1



2



3



4



5



6



7



8

2. Pîşeyê te çi ye/Tu çi karî dikî? Bipirse û bibersivîne.

Tu çi karî dikî?

Pîşeyê te çi ye?

Ez xwendekar im.

Ez bijîjk im.

HÎNKARÎ

1. Valahiyan bi peyvên guncan dagire.

A Rojbaş, ____ dora kîjan ajokarî ye?

B Fermo, ____ siwareya pêşiyê siwar be.

C Bibexşîne a niha telefonê ji min re hat, divê ____ rêwiyekî ji Navenda Perwerdehiya Kurdî hildim û wî daynim Enstîtuya Kurdî Ya Amedê. Fermo li siwareya paş min ____.

A Xem nake, tu li karê ____ binêre.

C Sipasî ji bo naziktiya cenabê ____.

A ____, bi silametî ____ û vegerî.

A Rojbaş, ____ tu hemşîre yî?

B Nexêr, ez ____ im, jûra hemşîreyan li ser milê rastê û li dawîya salonê ye.

A Rojbaş, gelo hemşîreyek dikare heta jûra nexweşan a çaran were?.

C Pirsgirêk ____ ye ____?

A Nexweşê min nikare hilma ____ bi rihetî hilde û ____.

C Baş e, a niha hemşîreyekê dişînim jûra we. Ji kerema xwe re tu vegere ____ nexweşê ____.

2. Hevokên jêrîn temam bike.

Ez mamoste ____.

Tu mamoste ____.

Ew mamoste ____.

Ez ne mamoste ____.

Tu ne mamoste ____.

Ew ne mamoste ____.

Ez bijîjk ____.

Tu bijîjk ____.

Ew bijîk ____.

Ez ne bijîjk ____.

Tu ne bijîjk ____.

Ew ne bijîk ____.

3. Pirs û bersivên jêrîn temam bike.

A ____ cenabê te dikare cihê kereseyên paqijiyê li min nîşan bide?

B Mixabin ez jî wekî te kiriyar im.

A ____ dezgehdarê vê reyonê nîn e ____?

B Ji wê xanima han a biforme bipirse, dibe ku ew li te nîşan bide.

A ____ reyona kereseyên paqijiyê li min nîşan nadi?

B Li milê çepê, li hemberî reyona kozmetîkê ye.

A Ma tu ne mamoste yî?

B Belê, ez mamoste me. Fermo daxwaza cenaba te çi ye?

D Gelo cenaba te bijîjk e?

E Nexêr, ez hemşîre me. Bijîjk di saet 13.00an de tê serdana nexweşan.

D Sipas.

C Sipasxweş.

4. Pirsên jêrîn bibersivîne.

Navenda Perwerdehiya Kurdî

KARTA ENDAMÊN RÛMETÊ

Nav û Paşnav: Ceylan Onkol

Temen: 14

Navnîşan: Kolana Azadiyê

Kuçeya Zarokên Pîroz

Jimare: 1 Amed/Kurdistan



P Ev karta kê ye?

B A Ceylan Onkolê ye.

P Temenê wê çend e?

B _____.

P Navnîşana wê kî der e?

B _____.

P Kîjan saziyê ev kart daye wê?

B _____.

JIMARE 31-100

1. Jimareyên jêrîn dubare bike.

- 31** sî û yek
- 32** sî û didu
- 33** sî û sisê
- 34** sî û çar
- 35** sî û pênc
- 36** sî û şeş
- 37** sî û heft
- 38** sî û heşt
- 39** sî û neh
- 40** çil
- 41** çil û yek

2. Nav û jimareyan berawirdî hev bike.


- | | |
|-----|-------------------|
| 50 | sed |
| 60 | pêncî |
| 70 | sed û yek |
| 80 | sed û çar |
| 90 | sed û çil û didu |
| 100 | şêst |
| 101 | sed û yazde |
| 104 | sed û bîst û sisê |
| 111 | heştê |
| 123 | sed û sî neh |
| 139 | heftê |
| 142 | nod |

FERHENGOK

1. Navên tiştan li ber wêneyan binvîse.



1



2



3



4



5

kovar



6




7

pisîk
lênûsk
~~kovar~~
rojname

depreş
demjimêr
sindoq
dirav
depnivîs



8



9

2. Wateya peyvên ferhengokê binvîse.

demjimêr: amûra ku demê dijmêre.

rojname: weşane rojane.

lênûsk: komêk rûpelên ku li ser tê nivîsandin.

3. Jimareya telefona xwe bide yekî an jî jimareya wî jê bixwaze.

A Jimareya telefona min 0532 546 89 17 e.

B Dikarî dubare bikî?

A Net, pênc, sisê, didu - pênc, çar, şeş - heşt, neh – yek û heft.



4 Malbat û Hevalbend

Cînavkên Pirjimar
Têkiliyên Malbatî
Axaftina Li Ser Telefonê

Cînavkên Tewandî
Têkiliyên Hevalbendiyê
Jimare 200-1000

DESTPÊK

1. Cînavkên yekjimar bîne bîra xwe.

<i>Ez</i>	<i>Tu</i>	<i>Ew</i>
-----------	-----------	-----------

2. Cînavkên pirjimar di hevokan de bi kar bîne.

<i>Em</i>	<i>Hûn</i>	<i>Ew</i>
-----------	------------	-----------

3. Bala xwe bide awayê tewandî û netewandî yê cînavkên yekjimar û pirjimar.

<i>Min</i>	<i>Te</i>	<i>Wî/Wê</i>
<i>Me</i>	<i>We</i>	<i>Wan</i>

4. Bala xwe bide awayê bikaranîna cînavkên tewandî û netewandî.

Cînavkên yekjimar û netewandî

Cînavkên yekjimar û tewandî

<i>Kî me ez?</i>	Welatê min Kurdistan e.
<i>Tu ji ku yî?</i>	Welatê te kî der e?
<i>Ew çi dike?</i>	Destê wî birîndar e.
	Dilê wê sax e, ew durûtiyê nizane.

Cînavkên pirjimar û netewandî

Cînavkên pirjimar û tewandî

<i>Kî ne em?</i>	Welatê me Kurdistan e.
<i>Hûn ji ku ne?</i>	Welatê we kî der e?
<i>Ew çi dikin?</i>	Mala wan çarqatî ye.



UGUR KAYMAZ Û MALBATA WÎ

Ugur Kaymaz kurê Ehmed û Meqbûle Kaymazê ye. Navê Apê wî Reşad e. Navê kekê wî Elî ye û navê birayê wî jî Hebîb e.

Ew li Taxa Turgut Ozal a Qosera Mêrdînê rûdinişt. Wî di Dibistana Dijleyê de dixwend. Temenê wî duwazde sal bû.

Dema ku ew û bavê wî yê Ajokar ji malê derketin derve ji aliyê polîsên romî ve bi hinceta ku endamên rêxistinê ne hatin kuştin. Sêzde gule di laşê wî yê ter û ciwan de teqiyân.

Kuştina Ugur û bavê wî yê Ehmed li seranserî Kurdistanê û cîhanê rastî nerazîbûnê hat. Tawanbar hatin tesbûtkirin; lê nehatin girtin. Şhadeta her du welatîyên kurd her sal tê bîranîn.


Her wiha navê Ugur Kaymaz li gelek kolan û parkan hatiye danîn. Ji bo bîranîna wî gelek nivîsar, helbest, şano û ceribandin hatine nivîsandin. Ev kuştina dilsoj bûye mijara sînemayê jî.

HÎNKARÎ

1. Bersivên van pirsan li gorî teksta jorîn bidin?

- Ugur Kaymaz kurê kê ye û çend salî ye?
- Ew ji kîjan bajarî ye û di kîjan dibistanê de dixwîne?
- Pîşeyê bavê wî çi ye?
- Ugur û bavê wî çima û ji aliyê kê ve hatin kuştin?
- Ugur Kaymaz û kesên mînanî wî çima tên bîranîn? Ramanên xwe vebêjin.
- Ji bo ku tu kes mînanî Ugur Kaymaz neyê kuştin divê çi bê kirin? Ramanên xwe vebêjin.

2. Xwe bikin dewsa zarokekî û kêmasiyên dara vê malbatê temam bikin.



3. Çi ferq di navbera wan de heye?

ap-xal, met-xaltî, biraza-birazî, xwarza-xwarzî, neve-nevî

4. Nimûneya jêrîn bixwînin û hevalekî/hevaleke xwe bidin naskirin.



Navê min Aydın Orak e. Ez hem şanoger im hem jî derhêner im. Min perwerdehiya şanoyê dîtiye. Min di hinek fîlm û lîstikan de rol hildaye. Lîstika min a bi navê Arafê gelek navdar e. Min û hevalên xwe me Şanoya Avestayê ava kiriye. Gelek endamên şanoya me hene. Ji wan hinek ev in:

Navê wî Cihan Şan e û hem şanoger e hem jî nivîskar e. Di gelek saziyan de şanogerî kiriye. Gelek meqaleyên wî yên li ser şanoyê hatine weşandin. Lîstika me ya “Araf/Di Navbera Du Dewletan De” berhema wî ye. Ew derhênerê baş e jî.



Bîlal Bulut lîstikvanekî me ye, di gelek lîstikên me de rol girtiye.



Ozgun Yarar muzîkjenekî me ye, ji lîstikên me re muzîkê çêdike.



Ehmed Çay ronahîsazê lîstikên me ye.



Perîxan Adalmiş lîstikvaneke me ye.

KURDIYA ROJANE

a. Li Ser Xeta Telefonê

Axaftina bi kesekî nas re

Azad: Elo!

Baran: Merheba Azado! Tu çawa yî?

Azad: Merheba hevalê Baran! Baş im, sipas. Tu çawa yî?

Baran: Ez jî baş im, sipas. Azado ez îro nehatibûm dibistanê, gelo te waneya îroyîn nivîsîbû an na?

Azad: Mixabin ez jî neçûbûm dibistanê, şîneke malbatê hebû.

Baran: Serê te sax be, bawer ke haya min pê tunebû. Nexwe min tu ji bo van tiştên bêbine aciz nedikirî û ez ê jî bihatama konê sersaxiyê.

Azad: Bila heval û hogir sax bin.

Baran: Ez ê hevalan hildim û werim. Lêborîna xwe dixwazim ji bo vê xemsariya xwe.

Azad: Bila giyanê te sax be bira, bi ser çavan re hatî.

Baran: Çavên te bi ser gulan. Vê gavê bi xatirê te.

Azad: Bi ser seran û çavan.

Axaftina bi kesekî nenas re

A: Enstîtuya Kurdî Ya Amedê, fermo!

B: Rojbaş, ez ji Wanê digerim. Min reklameke we di rojnameya Azadiya Welat de dît. Dixwazim pirtûka Hîlmî Akyol a “Çîrokên Mala Zalê” bikirim, gelo bihayê wê çi ye?

A: Bihayê wê 15 lîre ye û heqê şandinê aydî me ye. Gelo cenabê te dikare navnîşana xwe bide me?

B: Kolana Sixkê, J: 4, Wan.

A: Tu ji kerema xwe re navnîşanê bi tirkî jî nadî? Divê nivîsandina navnîşanê duzimanî be.

B: Baş e. Sihke Caddesi, No: 4 Van

A: Jimareya telefona cenabê te çi ye?

B: 0542 800 44 21 e.

A: Heke tu 15 lireyî bavêjî hesabê me yî di reklamê de û em ê tavilê ji we re bi kargoyê bişînin. Di navbera 3-5 rojan de dê bigihêje ber destê we.

B: Baş e, gelek sipas.

A: Sipasxweş, navê te bi xêr?

B: ...? (Telefonê digire)

b. Jimare 200-1000

200 dused (lîreyî/kîloyî)

300 sêsed (lîreyî/kîloyî)

400 çarsed (lîreyî/kîloyî)

500 pêncsed (lîreyî/kîloyî)

600 şeşsed (lîreyî/kîloyî)

700 heftsed (lîreyî/kîloyî)

800 heştсед (lîreyî/kîloyî)

900 nehsed (lîreyî/kîloyî)

1000 hezar (lîreyî/kîloyî)



5 Jiyana Min

Werziş, Xwarin û Vexwarin
Zimanê Kurdî û Zaravayên Wî
Dema niha

Zimanên Gelan
Alfabeya Kurdî û Kîtekirin
Jimartin û Bihayê Bûjenan

DESTPÊK

1. Jimare û peyvên berawirdî hev bike.



Werziş

- ☐ Ajneberî
- ☐ Gogbazî
- ☐ Tîlbazî
- ☐ Siwarbendî
- ☐ Tenîs

Xwarin

- ☐ Sêleqelî
- ☐ Kewaw
- ☐ Birinc
- ☐ Miqarne
- ☐ Savar
- ☐ Bestenî

Vexwarin

- ☐ Çay
- ☐ Kola
- ☐ Lîmonate
- ☐ Qehwe

EZ JI ÇI HEZ DIKIM Û JI ÇI HEZ NAKIM



Bozan Elo, Zagroso ez Bozan, çawa yî?

Zagros Gelek sax bî kekê Bozan. Tu çawa yî? Ev jimareya te ya nû ye gelo?

Bozan Ez jî baş im, sipas. Ez bi telefona hevalê Xwededa bi te re diaxivim. Heke tu jî îro vala bî fermo em herin seyrane. Em ê herin ber Şîpê Mirazan.

Zagros Ka hûn kî kî ne? Xwarin û vexwarin çi ye?

Bozan Ez im, hevalê Serhed e, hevalê Xwedêda ye û heke tu jî bêyî yek jî tu yî. Em ê berxekî ser jê bikin, ango sêleqeliya me heye. Vexwarina me jî av, kola û çay e.

Zagros Gelek baş e, ez ê jî werim. Kereseyê salateyê û kokos jî aydî min e; lê divê hûn nîv saetekê li benda min bisekinin heta ku ez amadekariya xwe bikim.

Bozan De baş e, em ê piştî 45 kêliyan te ji Sûka Şaredariyê hildin. Zêde nekeve mesrefê ha!

Taybetiyên Hevalan



Zagros

45 salî ye. Firoşkarê mêwe û sewzeyan e. Avjeniyê nizane. Ji sêleqelî û kokosê hez dike. Siwareya wî nîn e. Li taxa Mêrgezerê rûdine. Naçe betlaneyan, lê gava heval peyda bibin diçe seyrane û kurê xwe dide ber dezgehê xwe.



Bozan

43 salî ye. Karmendê saziyê ye. Avjeniyê dizane. Ji sêleqelî, salate û çayê hez dike; lê kokosê nakêşe. Siwareya wî heye û cîranê Zagrosî ye. Diçe betlaneya salane û seyranan. Ji seyrane hez dike.

1. Pirsan li gorî taybetiyên hevalan bibersivîne.

- Bozan çima û bi telefona kê bi Zagrosî re diaxive?
- Cihê seyrane li ku ye? Kî diçin seyrane?
- Zagros kî ye; ji çi hez dike û ji çi hez nake?
- Bozan kî ye; ji çi hez dike û ji çi hez nake?

2. Ka tu jî dikarî hinek taybetiyên xwe vebêjî, ji çi hez dikî û ji çi hez nakî?

3. Ka tu dikarî hinek taybetiyên hevalekî xwe vebêjî, ji çi hez dike û ji çi hez nake?

GELÊN CÎHANÊ Û ZIMANÊN WAN



Yan ji Çînê ye.
Zimanê wê çînî ye.
Paytextê Çînê Pekîn e.
Ew keçeke çînî ye.



Kanaka ji Hindistanê ye.
Zimanê wî hindî ye.
Paytextê Hindistanê Dellû ye.
Ew mirovekî hindû ye.



Antonyo ji Îtalyayê ye.
Zimanê wî îtalî ye.
Paytextê Îtalyayê Roma ye.
Ew mirovekî îtalî ye.



Semîre ji Misirê ye.
Zimanê wê erebî ye.
Paytextê Misirê Qahire ye.
Ew jineke misirî ye.



Akîra û Hîroşî ji Japonyayê ne.
Zimanê wan japonî ye.
Paytextê Japonyayê Tokyo ye.
Ew japonî ne.



Îgor û Alîna ji Ûrîsatê ne.
Zimanê wan ûrîskî ye.
Paytextê Ûrîsatê Moskova ye.
Ew her du jî ûrîs in.



Firanko ji Fransayê ye.
Zimanê wî franskî ye.
Paytextê Fransayê Parîs e.
Ew fransî ye.



Tom ji Ingilîstanê ye.
Zimanê wî ingilîzkî ye.
Paytextê Ingilîstanê London e.
Ew ingilîz e.


1. Tu jî hinek gelan û zimanên wan diyar bike.
2. Pêristeke gelên cîran û zimanên wan çêbike.

GELÊ KURD, ZIMANÊ KURDÎ Û ZARAVAYÊN KURDÎ

Gelê Kurd gelekî Rojhilata Navîn e. Zimanê wan Kurdî ye. Zimanê kurdî zimanekî Hind û Ewropî ye. Pênc zaravayên sereke yên zimanê kurdî hene:

- a. *Kurmanciya Jorîn (Kurmancî, Kirdasî)*
- b. *Kurmanciya Jêrîn (Sorani, Babanî)*
- c. *Kirmanckî (Dimilkî, Zazakî)*
- d. *Hewramî (Goranî)*
- e. *Lorî (Lekî)*

1. Di nexşeya jêrîn de belavbûna zaravayên kurdî hatiye destnîşankirin. Li gorî vê nexşeyê tu li ku yî?



2. Valahiyan bi peyvên guncan dagire.

- Kurdên Amedê bi zaravayên _____ diaxivin.
- Kurdên Hewlêrê bi zaravayê _____ diaxivin.
- Kurdên Dêrsimê bi zaravayê _____ diaxivin.
- Kurdên Birocerdê bi zaravayê _____ diaxivin.
- Kurdên Helebçeyê bi zaravayê _____ diaxivin.

3. Li nimûneyên jêrîn binêre û hinek hevokên bi dema niha binvîse.

Ez *diçim* dibistanê û kurdî *hîn dibim*.

Adar her roj di heşt û nîvan de *diçe* ser karê xwe.

Tu firavînê *dixwî* û ew tiştekî *naxwe*.

Ew hetanî êvarê tu tiştî *nakin*; lê tu çi *dikî*?

4. Çend tîpên alfabeya kurdî hene? De bijmêre.

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U û V W X Y Z

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p r s ş t u û v w x y z

Dengdarên alfabeyê: b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

Dengdêrên alfabeyê: a e ê î o u û (dengdêrên kurt: e î u; dengdêrên dirêj: a ê î o û)

a. Bi her tîpê 3 peyvên binvîse.

b. Çend nimûneyan bide peyvên ku bi pevdenga /xw/yê dest pê dikin.

c. Kîte çi ye? Hinek nimûneyan bide peyvên yekkîteyî, dukîteyî, sêkîteyî, çarkîteyî û pêncîteyî. Her wiha van peyvên kîte bike û binêre ka çend kîte ne:

aş, ba, ka, zû, dar, sar, hûr, merc, dest, şeft, teşt, stran, ala, dereng, benîşt, serhildan, kereş, berxwedan, temendirêj, zimandirêj, berawirdkirin ...

KURDIYA ROJANE

1. De bipirse bê ka kîjan tişt bi çendan e û bila hevalê te jî bersivê bide pirsên te.

BIHANAMEYA MARKETA MEZIN

1. Kereseyên Taştîyê



Penêr 6 L



Zeytûn 8 L



**Rûnê Nivîşk
13 L**



Doşav 5 L

2. Kereseyên Xurekî



Nan 40 Qrş



Miqarne 1 L



Birinc 3 L



Nîsk 1.5 L



Rûn 12 L



Savar 1.5 L



Xwê 50 Qrş



Salçe 2 L



Şekir 2.5 L

2. Kêmasiyên vê bihanameyê temam bikin.

3. Valahiyan bi peyvên guncan dagirin.

a. Savar bi çi ____?

b. Kîloya şêkir bi çendan e?

c. Liva nên bi ____?

d. Rûnê ____ bi çi ye?

Kîloya ____ bi lîre û nîvekê ye.

____ şêkir ____ du lîre û nîvan e.

Liva ____ bi çil qurîşî ye.

Kîloya wî ____ sêzde lîreyan e.



6 Her Roj

Dem û Danên Rojê
Dewsnîşan û Karnase
Qertaf

Rojên Hefteyê
Dema Niha I-II
Rêje û Amar

DESTPÊK

1. Li saetên jêrîn binêre û demên wan diyar bike. Tu bipirse û bila hevalê te jî bibersivîne.



1. Saeta te çend e?
2. Gelo dema civînê diyarkirî ye an na?
3. _____?

1. Saeta min ji yekê pênc derbas dibe.
2. Civîn di _____.
3. _____.

2. Di saziyên gelemperî de demên rojê li gorî 24 saetan tên diyarkirin. Li saetên jêrîn binêre û demên wan diyar bike. Bila hevalê te bipirse û tu jî bibersivîne.



HÎNKARÎ

1. Li wêneyên jêrîn binêre. Kî çi çaxê çi dike?



07:00

Azad



07:05

Baran



07:10

Reşo



07:20

Firat

a. Azad di saet heftan de ji xewê şiyar dibe.

- b. _____ .
- c. _____ .
- d. _____ .

2. Valahiyan bi peyvên guncan dagire.



Zozan û Reşo

07:30



Remoyê Parsek

08:00



Apê Şewket û Meta Şermîn

08:30




Celoyê Ziktêrdek

09:00

- A. Zozan û _____ di saet _____ de diçin _____.
- B. Remoyê _____ her roj _____ heştan de derdikeve _____.
- C. _____ û Meta Şermîn taştîyê dixwin. Saet niha _____.
- D. Celoyê _____ rojên betlaneyê _____ derdikeve werzişê.

SALERAST



Saziya Lêgerîna Rastiyan
2011

Qada xebat û lêkolînan

7 Parêzgehên Eyaleta Serhedê: Bazîd, Erzerom, Erzîngan, Îdir, Qers, Sêwas û Wan

Saetên xebatê:

08.00 – 12.00 (Danê Sibehê)

13.00 – 17.00 (Danê Nîvrojê)

Eşkerekirina Encaman:

21 Reşemî 2011

3. Di vê bernameyê de rojên hefteyê bibîne.

4. Tu jî lêgerînekê li ser rewşa civakî ya herêma xwe amade bike.

DEMA NIHA - I

Hevoka Pirsîyarî-Erênî

Ew çi ye?

Demjimêr çend e?

Ew wêneyê kê ye?

Hevoka Erênî

Ev pênûs e.

Demjimêr çar û nîv e.

Ev wêneyê şêhîdekî ye.

Hevoka Pirsîyarî-Neyînî

Ma ew ne pirtûk e?

Ma ew ne mirov in?

Ma tu ne bazîrgan î?

Hevoka Neyînî

Nexêr, ew ne pirtûk e hevalo!

Ew ne mirov in bira!

Na, ez ne bazîrgan im.

BERNAMEYA HEFTEYEKÊ

1. **Şemî:** Xizanî û cureyên parsekiyê
2. **Yekşem:** Pirsîgirêkên malbatên şêhîdan
3. **Duşem:** Bêdadî û bertekên civakê
4. **Sêşem:** Daxwazên gel ji rêvebiran
5. **Çarşem:** Serdana girtiyên siyasî
6. **Pêncşem:** Nîrxandina xebat û lêkolînan
7. **În:** Betlane

Hevserokên Desteya Komxebatê

1. Bedîrxanê Hesenê Mamo
2. Rewşena Cindiyê Misto

Endamên Desteya Komxebatê

1. Adarê Gundikî (Xizanî û cureyên parsekiyê)
2. Zelala Biro (Bêdadî û bertekên civakê)
3. Derwêşê Faro (Daxwazên gel ji rêvebiran)
4. Keleşê Bêkiras (Daxwazên malbatên şêhîdan)
5. Gula Bextiyarî (Serdana girtiyên siyasî)

DEWSNÎŞAN Û KARNASE

DEWSNÎŞAN

Eyalet: Botan

Parêzgeh: Mêrdîn

Navçe: Qoser

Tax/Gund: Taxa Turgut Ozal

Cih û mêjûya jidayikbûnê: _____



Nav û paşnav: Ugur Kaymaz

Navê bavî: Ehmed

Navê diyê: Meqbûle

Rewşa civakî: Nezewicî

Navnîşan: _____

Ev agehiyên jorîn gişt rast in.

Kesê Têkildar

Keyayê Taxê/Gund

DEMA NIHA – II

Di hevokên lêkerî de dema niha

|

Yekjimar

- Ez diçim bajêr. (Hevoka erênî)
- Tu sêvan naxwî. (Hevoka neyînî)
- Ma ew jî tê civînê?
(Hevoka pirsiyarî-erênî)
- Ma ew nabêje çî?
(Hevoka pirsiyarî-neyînî)

Pirjimar

- Em naçin bajêr. (Hevoka erênî)
- Hûn sêvan naxwîn. (Hevoka neyînî)
- Ma ew jî tên civînê?
(Hevoka pirsiyarî-erênî)
- Ma ew tişteki nabêjin?
(Hevoka pirsiyarî-neyînî)

PIRS Û BERSIV

1. Dewsnîşan çî ye? Ji bo wateya wê li ferhengê binêre.
2. Mêrdîn di kîjan eyaletê de ye?
3. Li ser tora ragihandinê cih û mêjûya jidayikbûna Ugur Kaymazî bibîne.

SALERAST

Saziya Lêgerîna Rastiyan



Rewşena Cindiyê Misto

Hevseroka Desteya Komxebatê

Kolana Azadiyê, Kuçeya Serxwebûnê, J: 123 Wan
+ 53 657 90 87 rewsencm@salerast.gov.ku

- A. Karnase çî ye? Ji bo wateya wê li ferhengê binêre.**
- B. Karnase bi kêrî çî tîn?**

QERTAF

Zêdehiyên ku bi alikariya wan ji peyvan hinek peyvên nû tên çêkirin

Pêşgir:

Qertafên ku tên
pêşiya peyvê

*bêbav
neyar
bindest
serbaz
berbaz
navmîl
daxistin
hilkirin
rakirin
vekirin*

Navgir:

Qertafên ku dikevin navbera
du peyvan an jî dikevin nava
peyvê

*seranser
beranber
xebat
şewat
girmegirm
zingezing
firemar
darebî*


Paşgir:

Qertafên ku tên paşiya peyvê

<i>avalû</i>	<i>dûralû</i>	<i>derzîdank</i>	<i>soldank</i>
<i>mirovafî</i>	<i>kirîvafî</i>	<i>xemgîn</i>	<i>mizgîn</i>
<i>meyxane</i>	<i>qeyxane</i>	<i>aşvan</i>	<i>baxvan</i>

RÊJE Û AMAR

SALERAST



Saziya Lêgerîna Rastiyan
2011

ENCAMA RAPIRSÎNA GEVERÊ YA 2011AN



© Mysir Arts, LLC

*Rêjeya zarokên ku
dixvazîn bi kurdî
perwerde bibin*

% 100



*Rêjeya kesên ku
rojnameya Azadiya
Welat dixwînin*

% 69



Rêjeya xortên bêkar

% 6

Rêjeya xortên xwendê

% 87



*Di nav jêniyên kurd
de rêjeya diziyê*

% 0



7 Heft Şaheserên Kurdistanê

Şaheserên Kurdistanê
Amanên Malê
Zayend

Mêjûnasiya Dîroka Kurdistanê
Dema Bihurî
Mengiranî û Mendirêjahî

DESTPÊK

1. Wêneyê Bedenên Amedê bi jimareya 2an hatiye nîşandan. Jimareya wêneyê guncan di qutîkê de binvîse.

☐ Nîgareyên Bîstûnê



☐ Keleha Behlûl

☐ Kevnebarê Heskîfê

☐ Keleha Hewlêrê

☐ Peykerên Nemir

☐ Keleha Dimdimê



2. Zanyariyên derheqa şaheseran de bixwîne û pirsan bibersivîne.



Bedenên Amedê

Li gorî texmînan ev beden 5000 sal berî niha hatiye avakirin.. Desthilatdariya Hûriyan ew ava kirine. Piştî Bedenên Çînê bedenên herî dirêj Bedenên Amedê ne. Dirêjahiya wan 5 kîlomêtro ye. Bilindahiya dîwarên wan 12 mêtro ye. Çar heb dergehên wê hene: Dergehê Rihayê, Dergehê Mêrdînê, Dergehê Çiyê û Dergehê Nû. Di hundirê bedenê de 16 heb keleh û 82 heb birc hene.

1. *Bedenên Amedê kengê hatine jenîn?*
2. *Taybetiyên wan çi ne?*

Keleha Hewlêrê

Ji kelehên herî kevnare yên cîhanê yek jî Keleha Hewlêrê ye. 8000 sal berî niha hatiye avakirin. Qada kelehê li ser 102 hezar mêtro çarçikî ava bûye. Ev keleh bûye landika gelek şaristaniyan. Niha tê de sê tax hene: Taxa Serayê, Taxa Derwêşan û Taxa Topxaneyê.

1. *Keleha Hewlêrê kengê hatiye jenîn?*
2. *Taybetiyên wê çi ne û niha çend taxên wê hene?*



Keleha Dimdimê

Di serê sedsala 17an de hatiye avakirin. Xanê Lepzêrîn ew ava kiriye. Qada wê 2000 mêtro bûye. Di şerê navbera kurd û farisan de hilweşiyaye. Nêzikî Gola Urmiyeyê ye. Feqiyê Teyran derheqa vê kelehê û Xanê Lepzêrîn de destanek nivîsiye. Keleh ji aliyê osmaniyan ve hatiye rûxandin.

1. *Xanê Lepzêrîn kî ye? Derheqa wî de hinek agehiyan berhev bike.*
2. *Tu derbareya Destana Dimdimê de çi dizanî?*



Peykerên Nemir

2000 sal berî niha di dema şaristaniya Komageneyê de li nêzikî Semsûrê hatine çêkirin. Bilindahiya hinek peykeran digihêje 10 mêtroyan. Hem şahesereke Kurdistanê ye hem jî şahesereke cîhanê ye. Li hinda van peykeran dîmena xwezayî ya hera xweş hilatin û avabûna rojê ye.

1. Ev peyker di tixûbê kîjan bajarî de ne?
2. Çi demê û ji aliyê kê ve hatine çêkirin? Hinek agehiyan berhev bike.



Nîgareyên Begistanê (Bîstûnê)

Nigareyên Begistanê nêzikî bajarê Kirmanşanê ne. Li vir gelek nîgare, nivîsên bizmarî û peyker hene. Gelek şaristaniyan li vir şopên xwe hiştine. Peymana Mafên Mirovan a hera kevnare li vir hatiye nivîsandin. Ev nivîs bi zimanê Avestayê ye.

1. Girîngiya Peymana Mafên Mirovan çi ye?
2. Avesta çi ye? Hinek agehiyan berhev bike.



Keleha Behlûfî

Li Bazîdê ye. Di sedsala 18an de hatiye jenandin û avakirina wê di 99 salan de qediyaye. Qada wê li ser 7600 mêtro çarçikî ye. Di cîhanê de pergala kalorîfer û kêzînan tenê di vê kelehê de heye. Tê de 116 ode, mizgeft, dîwanxane, aşxane, zindan, embar, firne, hemam û gelek hêwan hene.

1. Keleha Behlûfî li ku ye û kengê hatiye jenandin?
2. Taybetiyên vê kelehê çi ne?





Kevnebajarê Heskîfê

3800 sal berî niha xîmê vî bajarî hatiye avêtin. Bajar di zinaran de hatiye çêkirin. Hemû rê, seray, keleh, dêr û mizgeft bi kolandina zinaran hatine afirandin. Ava bajêr bi riya cihokên kevirîn ên hundirîn ve hatiye bidestxistin.

1. Taybetiyên Kevnebajarê Heskîfê çi ne?
2. Ev bajar rû bi rûyî kîjan xetereyan e?

MÊJÛNASIYA DÎROKA KURDISTANÊ – I

[1514-1922]

- 1514 - Di dema tevgera sultanê osmanî Yavuz Selîm ya Çaldiranê de eşîrên sunî yên kurdan xweseriya xwe parastin û bi hikûmeta Stenbolê ve hatine girêdan.
- 1639 - Kurdistan bi Peymana Qesra Şîrînê di navbera osmanî û sefewiyan de hate parvekirin.
- 1832 - Şerê Mîr Mihemedê Rewandîzî bi osmaniyan re.
- 1843-1846 - Serhildana Şêx Ubeydulahê Nehrî li hemberî rêveberiyên osmanî û îranî.
- 1889, 22ê Avrêlê - Yekemîn rojnameya kurdan a bi navê "Kurdistan li Qahireyê dest bi weşanê kir.
- 1908, 22ê Reşemiyê - Rojnameya Kurd Teawun û Tereqî dest bi weşanê kir.
- 1908, 19ê Rezberê - Komeleya Kurd Teawun û Tereqî hate damezrandin.
- 1913, Gulan - Komeleya "Hêvî" ya kurd hate damezrandin.
- 1913, 19ê Rezberê - Kovara Yekbûnê dest bi weşanê kir.
- 1918, 10ê Berfanbarê - Komeleya Kurd Tealî hate damezrandin.
- 1918, 7ê Kewçêrê - Kovara Jînê li Stenbolê dest bi weşanê kir.
- 1919, 21ê Pûşperê - Kovara Jîn ya heftane dest bi weşanê kir.
- 1919, 23ê Gulanê - Tevgera Serxwebûna Kurdistanê bi rêberiya Şêx Mehmûdê Berzencî dest pê kir.
- 1919, Gulan - Komeleya Kurdistan Tealî hate damezrandin.
- 1920, 10ê Tebaxê - Peymana Sêwrê ya ku Kurdistan û Ermenistaneke serbixwe dixwestin li dar ket.
- 1921, 6ê Adarê - Berxwedana Koçgiriye.
- 1922, 5/28ê Tebaxê - Serhildana Simkoyê Şîkakî li rojhilatê Kurdistanê.
- 1922, 11ê Pûşperê - Îlankirina Mîrîtiya Kurd ji aliyê Şêx Mehmûdê Berzencî ve.

ZAYEND

(rewşa nêrtî û mêtîya peyvê)

Zayenda Suriştî

jin - mêr
dê - bav
met - ap
xaltî - xal
nû - beran
mehîn - hesp

Zayenda Rêzimanî

mê
sêv, bêjing, qirik,
pişt, roj, av, çal
nêr
kevçik, dest, gopal
şer, ser, dev, dîwar

AMANÊN MALÊ



- | | | | | |
|-----------|-------------|-------------------------|-----------------------|-------------------|
| 1. Kevçik | 7. Kêr | 13. Kefgîr | 19. Textikê Hûrkirînê | 25. Kerdnek |
| 2. Maşik | 8. Şewk | 14. Îskana avê | 20. Sefînek | 26. Legan |
| 3. Meqes | 9. Qûşxane | 15. Îskana çayê û binik | 21. Çaydank û avdank | 27. Kefçikê darîn |
| 4. Rendeş | 10. Kasik | 16. Pingan | 22. Dîzik | |
| 5. Hesk | 11. Xwêdank | 17. Boçesêlîn | 23. Çêjdank | |
| 6. Avdank | 12. Çoçik | 18. Piyale | 24. Sinûk | |

DEMA BIHURÎ

*Ez zarok bûm.
Tu zarok bûyî.
Ew zarok bû.*

*Ez ne zarok bûm.
Tu ne zarok bûyî.
Ew ne zarok bû.*

*Em zarok bûn.
Hûn zarok bûn.
Ew zarok bûn.*

*Em ne zarok bûn.
Hûn ne zarok bûn.
Ew ne zarok bûn.*

*Ez xwenda bûm.
Tu xwenda bûyî.
Ew xwenda bû.*

*Ez ne xwenda bûm.
Tu ne xwenda bûyî.
Ew ne xwenda bû.*

*Em xwenda bûn.
Hûn xwenda bûn.
Ew xwenda bûn.*

*Em ne xwenda bûn.
Hûn ne xwenda bûn.
Ew ne xwenda bûn.*

*Ez çûm bajêr.
Tu ketî 18 salîya xwe.
Ew hat vir jî.*

*Em çûn bajêr.
Hûn ketin male.
Ew hatin vir jî.*

*Ez neçûm bajêr.
Tu neketî 18 salîya xwe.
Ew nehat vir jî.*

*Em neçûn bajêr.
Hûn neketin male.
Ew nehatin vir jî.*

MENGIRANÎ Û MENDIRÊJAHÎ



Terazî



Qeynter

GIRANÎ Û MENGIRANÎ



Giranî

Tonek hezar kîlo ye.
Kîloyek hezar gram e.
Gram 1000 mîlîgram e.


Menê pîvana giraniyê gram e û kurtenavê gramê /gr/ ye.

Kurtenavên Mengiraniyan	
kîlo = kg	gram = gr
mîlîgram = mg	

DIRÊJAHÎ Û MENDIRÊJAHÎ

Her tişt di valagehê de xwediyê sê rehendan e: 1. Dirêjahî 2. Pehnahî 3. Bilindahî

1. Dirêjahî rehendê dakîsandî yê her tiştî ye.
2. Bilindahî berfirehiya tiştan a bi awayê stûnkî ye.
3. Pehnahî dûrahiya navbera aliyekî heta aliyê din e.



Hemû rehend bi mendirêjahiyê tînan pîvan. Menê pîvana dirêjahiyê mêtroye.

Hezar mêtroye kîlomêtroye e.
Mêtroye sed santîmêtroye ye.
Her wiha mêtroye hezar mîlîmêtroye ye.



Kurtenavên mendirêjahîyan	
kîlomêtroye = km	mêtroye = m
santîmêtroye = cm	mîlîmêtroye = mm

Dîdariyek bi nimûneyên bikaranîna mengiranî û mendirêjahîyan:

Azad: Rojdayê bejna te çend santêm e?

Rojda: Te xêr e ji santêm û mîlîman Azado? Bejna min 160 santêm e, lê ya te?

Azad: Bejna min jî 175 santêm e, ez jî te bilindtir im.

Rojda: Ez jî 85 kîlo me. De bibêje ka tu çend kilo yî?

Azad: Ez belengazê Xwedê jî 75 kîlo me. Ji te bilindtir û ji te siviktir im.

Rojda: A wiha were îmanê ha!



9 Rojbûna Te Pîroz Be!

Navên Mehan û Mêjû
Ajalên Kovî û Kedî
Dema Bê

Mêjûnasiya Dîroka Kurdistanê II
Veqetandek û Baneşan
Birkariya Reşekurmancî

DESTPÊK

1. Li salnameya jêrîn binêre û navên mehan di lênûska xwe de binvîse.

2009			
Rêbendan 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30 31	Reşemî 1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28	Adar 1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28	Avrêl 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30
Gulan 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30 31	Pûşper 1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30	Tûmeh 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30 31	Tebax 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30 31
Rezber 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30	Kewcêr 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30 31	Sermawez 1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30	Berfanbar 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21 22 23 24 25 26 27 28 29 30 31

2. Ji xwe re bernameyeke mehane çêbike û karên xwe yên girîng li gorî mêjûyên wan rêz bike.

- 01.02.2011 Beşdarî civîna ciwanan be. Cihê civînê li Navenda Çandê ye.
- 04.02.2011 Here serdana parêzerê xwe. Danê êvarê ji bo serdanê çêtir e.
- 10.02.2011 Ji bo Roja Reş daxuyaniyeke çapemeniyê amade bike.
- 13.02.2011 Beşdarî civîna ciwanan be. Cihê civînê li Navenda Çandê ye û teksta daxuyaniya amadekirî bi xwe re bibe.
- 14.02.2011 Ji bo rojiya rûmetê rabe paşîvê.
- 15.02.2011 Sibehê zû rabe û di demjimêr 08.00an de li Rêxistina Partiyê be.
- 16.02.2011 Beşdarî civîna ciwanan be. Civîn li Navenda Çandê ye. Mijar: Bertekên kurdan li dijî komploya navneteweyî.


MÊJÛNASIYA DÎROKA KURDISTANÊ – II

[1923-1982]



- 1923, 24ê Tîrmehê - Peymana Lozanê hate şanavkirin; parçebûna Kurdistanê.
- 1925, 14ê Reşemiyê - Serhildana mezin a kurdan: Tevgera Şêx Seîdê Pîran.
- 1925, 16ê Berfanbar - Serhildana başûrê Kurdistanê li hemberî rêveberiya Ingilîzan
- 1925, 4ê Rezberê - Şêx Seîdê Pîran û 52 hevalên wî hatin darvekirin.
- 1926, 16ê Gulanê - Serhildana Agiriyê û komkujiya yekem a Agiriyê
- 1927, 26ê Gulanê - Serhildana Mutkiyê.
- 1927, 8 Rezberê - Komkujiya duyem a Agiriyê.
- 1927, Tebax - Komûteya neteweyî ya kurdan Xoybûn hate damezrandin.
- 1929, 22 Gulanê - Serhildana Geliyê Zilan.
- 1929, 14 Rezberê - Komkujiya Tendûrekê.
- 1930, 7 Rezberê - Komkujiya Agiriyê Ya Sêyemîn.
- 1931, Gulanê - Balafirên Ingilîzan berxwedana Şêx Berzencî şikandin.
- 1932, 5ê Gulanê – Ji bo kurdan qanûna sergomkirinê ya "Bicihkirina Mecbûrî" kete fermiyetê.
- 1935, 25ê Berfanbarê – Ji bo kurdên Dêrsimê "Qanûna Dêrsimê" ya sitemkarane hate derxistin.
- 1937, 5ê Rezberê - Pêşengê Serhildana Dersimê Seyîd Riza hate girtin
- 1938, 21ê Adarê 1937/16ê Rezberê- Berxwedana Dersimê û qirkirina komî.
- 1945, Tebax - Partiya Demokrat A Kurdistanê Îranê (Î-KDP) hate damezrandin.
- 1946, 13ê Berfanbar - Li Mahabadê Komara Kurdistanê hate damezrandin.
- 1946, 16ê Tebaxê - Partiya Demokrat Ya Kurdistanê Îraqê- I-KDP hate damezrandin.
- 1947, 17ê Berfanbarê - Komara Kurdistanê ya li Mahabadê hate rûxandin.
- 1947, 22ê Reiemiyê - "Meşa Dirêj" a kurdan di bin serokatiya Mele Mistefayê Barzanî de.
- 1958, 14ê Pûşperê/27 Tîrmehê - Key Faysal ji text ket û Îraq wekî komara hevbeş a kurd û ereban hate binavkirin.
- 1958, 7ê Kewçêrê - Mele Mistefayê Barzanî yê ku ji tarawgehê vegeriya Îraqê.
- 1961, 11ê Rezberê - Li başûrê Kurdistanê li hemberî pergala Îraqê şerê çekdarî dest pê kir.
- 1962, 5ê Kewçêrê - Di serjimariya ku li Sûriyeyê pêkhatî de 120 hezar kurd wekî "biyanî" hatin binavkirin û hemû mafên wan ên hemwelatîyê ji destên wan hate girtin.
- 1969, Gulan - Navendên Çandî Yên Şoreşgerên Rojhilatî DDKO hate damezrandin.
- 1970, 11ê Adarê - Tevgera başûrê Kurdistanê xweserîya xwe bi pergala Îraqê da pejirandin.
- 1974, 11ê Adarê – Ji ber ku pergala Îraqê peymanî xweseriyê bînpê kir şer û pevçûnên dijwar di navbera kurd û hêzên pergala de dest pê kirin.
- 1975, 5ê Adarê – Şanavkirina Peymana Cezayîrê di navbera Îran û Îraqê de; êrişên hevbeş ên dijwar li hemberî tevgera kurdan û belavbûna hêzên kurd li başûrê Kurdistanê.
- 1975, Pûşper - Yekîtiya Niştimanî Ya Kurdistanê (YNK) hate damezrandin.
- 1978, 11ê Rêbendanê - Komkujiya li hemberî elewiyên Gurgumê.
- 1978, 18ê Gulanê - Heqî Karer hate qetilkirin.
- 1978, 27ê Kewçêrê - Partiya Karkerên Kurdistanê PKK li Fîsê hate damezrandin.
- 1979, 1ê Adarê - Serokê PDKyê Mele Mistefayê Barzanî li Amerîkayê mir.
- 1979, 17ê Tebaxê - Mehabad kete destê hêzên kurd.
- 1979, 5ê Rezberê – Pergala Îranê li dijî kurdan fermana cenga pîroz derxist û êrişî kurdan kir.
- 1980, 12ê Berfanbarê - Di encama êrişa pergala tirk û sûrî de li Qamişloyê 15 milîtanên KAWAyê hatin qetilkirin.
- 1982, 21ê Adarê - Mazlum Dogan di zindana Amedê de şehîd ket.





Mêşa Hingivî



AJALÊN KEDÎ



AJALÊN KOVÎ



1. Li gorî devoka xwe pêristeke ajalên malê û çolê yên jorîn çêbike.
2. Pêrista xwe berawirdî vê pêrista jêrîn bike.

- | | | | |
|--------------------|---------------------|--------------|-----------------|
| 1. Beran | 11. Werdek | 21. Ask | 31. Şêr |
| 2. Ga | 12. Seg | 22. Jûjî | 32. Cirdê Xezal |
| 3. Nêrî | 13. Qaz | 23. Kerkedan | 33. Mişk |
| 4. Pisîk | 14. Hesp | 24. Pîl | 34. Meymûn |
| 5. Dîk | 15. Mehîn û canî | 25. Hirç | 35. Piling |
| 6. Mî û berx | 16. Gamêş | 26. Pezkovî | 36. Gurg |
| 7. Çêlek û golik | 17. Manker û cehşik | 27. Rovî | 37. Kûsî |
| 8. Bizîn û kar | 18. Hêstir | 28. Zirafe | 38. Sivorî |
| 9. Tûfî | 19. Kêvrîşk | 29. Beraz | |
| 10. Mirîşk û cûcîk | 20. Hêştir | 30. Şivir | |

VEQETANDEK

Qertafên ku peyvan bi hev ve girêdidin; mêjer û zayendê nîşan didin.

1. Veqetandekên Nas

/-ê/ yekjimar û nêrza
Bavê wî nehatiye.
Hespê wan orxe ye.
Bajarokê me xweş e.

/-a/ yekjimar û mêza
Xwişka wî diçe dibistanê.
Bizîna me cewî zaye.
Dara sêvê bişko daye.

/-ên/ pirjimar û bêhêl
Jinên kurdan jêhatî ne.
Beranên me jar in.
Lepên pergala zilmê qirêj in.

2. Veqetandekên Nenas

/-ekî/ yekjimar û nêrza
Birayekî wî karsaz e.
Gayekî me çûr e.
Şalekî reş li xwe kiriye.

/-eke/ yekjimar û mêza
Xwişkeke wî endazyar e.
Mirîškeke wê winda bûye.
Dareke tûyê li ber nehatiye avdan.

/-ine/ pirjimar û bêhêl
Hevaline me çalakî li dar xistine.
Xortine xîretkêş êriş birine ser dagirkeran.
Darine me bişko dane.

BANEŞAN

Peyvên ku cureyên hestan û rengê dengên nîşan didin.

Peyvên ku di binyada xwe de baneşan in

ax!, wax!, hey!, lo! wey lo/lê!, hey lo/lê!,
erik!, peh peh!, ox!, oxweş! hey wax!,
de! wî!, ha ho!, hoşt!, kiş! çol!, ho! û hwd

Peyvên ku rengê dengên nîşan didin

vizzz!, girmmm!, teeeq!, virrr!, pisss!
zing!, çirt!, şirp!, lop!, xuşşş!, virç!,
çizzz!, tûûtût!, xişt!, milç! qurt! û hwd

Navdêrên ku dibin baneşan li gorî mêjer û zayendê hinek qertafan digirin

<i>/-o/ yekjimar û nêrza</i>	<i>/-ê/ yekjimar û mêza</i>	<i>/-ino/ pirjimar û bêhêl</i>
<i>Bavo tu çi dikî!</i>	<i>Dayê megirî!</i>	<i>Keçino baldar bin!</i>
<i>Keko tu jî biaxeve!</i>	<i>Xûçê avekê nadî min!</i>	<i>Xortino bilezînin!</i>
<i>Birayo ev çi karesat e!</i>	<i>Keçê rabe, em dereng man!</i>	
<i>Welato ez qurban!</i>	<i>Kebaniyê destên te neêşin!</i>	<i>Gelîan! pirjimar û bêhêl</i>
<i>Karo tu herî devê kulê!</i>	<i>Bizîne tu bimirî!</i>	<i>Gelî jinan mafên xwe biparêzin</i>
<i>Hespo tu bicehimû!</i>	<i>Pergalê tu zû hilweşî!</i>	<i>Gelî mêran dem dema xebatê ye</i>

DEMA BÊ

Dema ku em dixwazin di pêşerojê de an jî paşê karekî bikin em lêkera dema bê bi kar tînin.

ERÊÎ

*Ez dê bixebitim.
Ew dê xwe veşêre.
Tu dê kar bikî.
Em dê bi cih bînin.*

NEYÎÎ

*Ez dê nexebitim.
Ew dê xwe veneşêre.
Tu dê kar nekî.
Em dê bi cih neyînin.*

PIRSIYARÎ

*Ma ez dê bixebitim?
Ma ew dê çi veşêre?
Ma tu dê kar bikî?
Ma em dê bi cih bînin?*

PIRSIYARÎ- NEYÎÎ

*Ma ez dê nexebitim?
Ma ew dê veneşêre?
Ma tu dê kar nekî?
Ma em dê bi cih neyînin?*

DEMA BÊ YA NÊZIK

Gava em bixwazin di demeke nêzik de karekî bikin em lêkera dema bê ya nêzik bi kar tînin.

ERÊÎ

*Ew dike bilive.
Tu dikî vereşî.
Ez dikim têr bibim.
Hûn dikin bar bikin.*

NEYÎÎ

*Ew dike nelive.
Tu dikî venereşî.
Ez dikim têr nehim.
Hûn dikin bar nekin.*

PIRSIYARÎ

*Ma ew dike bilive?
Ma tu dikî vereşî?
Ma tu dikî têr bibî?
Ma hûn dikin bar bikin?*

PIRSIYARÎ- NEYÎÎ

*Ma ew dike nelive?
Ma tu dikî venereşî?
Ma tu dikî têr nebî?
Ma hûn dikin bar nekin?*

BÎRKARIYA REŞEKURMANCÎ

Nîşaneyên bîrkariya reşekurmancî

$+$: zêdek $-$: kêmek $\div$: dabeşker $\times$: carker $=$: yeksan

$\begin{array}{r} 123 \\ + 321 \\ \hline 444 \end{array}$ 321an li 123an zêde bikî yeksanî 444an e.	$\begin{array}{r} 321 \\ - 123 \\ \hline 198 \end{array}$ Ji 321an 123an kêm bikî yeksanî 198an e.	$\begin{array}{r} 123 \\ \times 2 \\ \hline 146 \end{array}$ 2 caran 123 yeksanî 146an e.	$144 \div 8 = 18$ 144an li 8an dabeş bikî yeksanî 18an e.
--	---	--	--

SPARTE

1. Kîjan saziyên kurdan kîjan navên mehan bi kar tînin?
2. Navên ajalên malê yên mê û nêr digel navên têjikên wan binvîse.
3. Ji bo veqetandek, baneşan û dema bê 5 nimûneyan bide.
4. Ji bo bîrkariya reşekurmancî 4 nimûneyan bide.